

Maf û berpirsyariyên xwedyên xêrî û kirêgiran

Mafên te û berpirsyariyên te

Heke tu li avahiyekê şexsî hatiye kirêkirin kirêgir bî, mafên te û berpirsyariyên te hene.

Mafên te

Wekî kirêgir mafê te heye ku tu:

- li avahiyekê bijî ku ewle be û rewşa wê baş be
- li dijî heqê kirê yê zêde li ber xwe bidî
- bizanî ka xwedyê xênî kî ye
- li avahiyekê bijî ku aramiya wê hebe
- ji bo avahiyê Sertîfikaya Performansa Enerjiyê bibînî
- li hemberî tehliye û kirêya ne bi mafdarî bêyî parastin
- peymaneke nivîskî wergirî, heke ji 3 salan zêdetir kirêgiriya te ya dema sabît hebe

Heke peymaneke te ya kirê hebe, divê ev edilane û li gorî qanûnan be.

Berpirsyariyên te

Divê tu destûrê bidî xwedyê xênî ku xanî saxtî bike û tamîran bike. Divê xwedyê xênî herî kêr 24 demjimêran di pêşiyê de agahiyê bide te û heke ne rewşeke acîl be ku bivê demildest têkeve avahiyê, divê di demeke maqûl ya navrojê bê.

Her wisa divê tu:

- baş hay ji avahiyê hebî, wekî mînak heke di hewayê sar de tu herî ciyekî dûr, divê tu ava xetê bigirî
- kirêya lihevkerî bidî, her çend tamîrkarî pêwîst bin yan jî di navbera te û xwedyê xênî de lihevnekirin hebin
- lêçûnên din jî bidî ku te û xwedyê xênî li ser li hev kiriye, wekî mînak Baca Şaredariyê yan jî fatureyên elektrîkê
- ji bo ziyarîna ji te, ji malbata te yan jî ji hevalên te qewimîne tamîrkariyê bikî yan jî perê wê bidî
- avahiyekê tenê heke peymanî kirê yan jî xwedyê xênî destûrê bide bidî kirê

Heke tu berpirsyariyên xwe neynî cî, mafê xwedyê xênî heye ku ji bo te ji malê derxe serî li riyên fermî bide.

Berpirsyariyên xwediyê xênî yên ewlekariyê

Divê xwediyê xênî avahiya tu tê de dijyî ewle bigire û ji xetereyên tenduristiyê dûr bigire.

Ewlekariya gazê

Divê xwediyê xênî:

- teqez bike ku ekîpmana gazê ya hatî dabînkirin ji aliyê endezyarekî li Gas Safe qeydkirî ve bi awayekî ewle hatiye saz kirin
- ku ji bo li her cîhazê û kulekê kontrola ewlekariya gazê ya salane bi endezyarekî qeydkirî bide çêkirin
- beriya tu bar bikî yan jî 28 rojan piştî kontrolê, kopiyê qeydiya kontrola ewlekariya gazê bide te

Ewlekariya elektrîkê

Divê xwediyê zênî teqez bike ku:

- pergala elektrîkê ewle ye, wekî mînak prîz û armatûrên ronîkirinê
- hemû amûrên dabîn kirine ewle ne, mînak ocax û ketil

Ewlekariya şewatê

Divê xwediyê xênî:

- li gorî rêgezên ewlekariyê tev bigere
- li her qatê alarmeke dûmanê û li her odeyeke alaveke şewitandina ardûyê req (mînak sobeyeke daran yan jî ya komirê) tê de heye alarmeke karbonmonoksîdê dabîn bike
- kontrol bike ka hemû caran rîya revê ji te re vekirî ye yan na
- teqez bike ka alav û mobîlyayên dabîn kirine li ber şewatê baş in yan na